

Familjecentral bêhempa ye

Familjecentral (Navenda Malbatî) navendeke bêhempa ye, ji ber ku em kesên li vir dixebitin, dikarin di gel we bi hêsanî hevkarîyê bikin, daku çareserîyan ji bo pêwîstiyên cuda peyda bikin. Gava pêwîstiya dêbavan bi piştgiriyeke zêde ya biçûk hebe, ev der ji bo wan, bi awayeke lez, hêsanîyan peyda dike. Erk û delameta xebata Familjecentral'ê ev e, tiştên ku dilê dêbavan û zarokên wan xweş dike, xurttir bike û pêşîya tiştên ku problem yan xirabî derdixin, bigire. Em vî karî dikin daku em:

- ▶ Her dem wek ciyeke nêzik ji bo we amade bin.
- ▶ Tora civakî ya li dora zarok û dêbavan xurttir bikin.
- ▶ Karên nuh peyda dikin, daku hem zaro û hem ji dêbav pêkve bin.
- ▶ Wergirtina alîkarîyê hêsan bikin.
- ▶ Wek navendeke zanyarî û agehiyê bixebitin.
- ▶ Ji bo we dêbavan xizmeteke baştir bikin.

Familjecentral li seranserê Swêdê heye. Ji çakiya xwe, agehiyên bêhtir li ser vê malperê bibîne: Föreningen för familjecentraler främjandes (FFFF): www.familjecentraler.se



FÖRENINGEN FÖR
FAMILJECENTRALERS
FRÄMJANDE

www.familjecentraler.se

Bi xêr hatî bo Familjecentral'a Xwe!

Ciyê hevdîtina hemû
kesên wê bibin dêbav
û malbatan.



FÖRENINGEN FÖR
FAMILJECENTRALERS
FRÄMJANDE



Hemû tişt li dor malbata bi zarok hatiye komkirin!

Wan hemû tiştên ku zaro, dêbav, yan kesên, ku wê nû bibin dêbav, pêwîstî pê hene, me li vir kom kiriye. Te derfet heye, ku gava pêwîstî hebe, tu herî muayenexaneya pîrikê, muayenexaneya sexbêriya zarokan, zarokxaneya vekirî, şewirkarî û piştgiya ji Xizmeta Civakî û ya herî dawîn, lê ne ya herî kêrî jî ev e, şewirkarî û piştgiya ji pîzanîn û tecrubeyên dêbav û zaroyên din.

Hemû li ciyekî hatine komkirin. Serbest e, Çi cûre malbat dibe bila bibe, ji her malbatekê re vekirî ye. Hatina Familjecentral'ê bêpere ye.

Li vê derê, gelek kesên xwedî pişe û sanatên cihêreng, ji bo qenciya te û zarokên te pêkve dixebitin: pîrik, hemşîreyên xwedîtaybetmendî, mamosteyên zarokxanayan û sosyonom. Doktor û psikolog jî hene gava pêwîstî hebe û her wisa jî, ji pişe û sanatên din şewirkarê bo malbatan hene. Em ji bo piştgiyê kirina te û zarokên te û pêwîstiyên te, xwe amade dikin. Tu dikarî derbareyê gelek tiştan pirsan ji me bikî; pirsên wek li ser endîşeyên tendurustiyê, pirsên li ser pêşketina zarokên te û pirsên din ên rojane yên dêbavan.

Bingeha vê xebatê

Muayenexaneya Sexbêriya Zarokan. (Sxebêriya Tendurustiyê ya ji bo Jinan, Sexbêriya Tendurustiyê ya ji bo Dayikan) Tu dikarî li vir, dema tu ducanî (heml) bî, herî nik pîrikê. Li vir, agehiyên derbareyê tendurustiya xwe werbigirî û beşdarê nav komeke dêbavan bibî. Gava mirov ducanî be, gelek pirs li serê mirov peyda dibin. Tu dikarî van pirsan, bi pîrika xwe re, yan jî pêwîstî hebe, bi psikolog re, li nav komeke dêbavan guftûgo bikî. Gava zarokê te hat dunyayê, tu ji bo kontrolê diçî vir û li ser preventivmedel (navgîna pêşîlêgirtina avisiyê) şîretan jî werbigirî.

Sxebêriya tendurustiya zarokan. Li vê derê derfeta serdanên cihêreng ên ji bo tendurustiyê hene. Ta zarokê te dest bi dibistanê bike, carinan jî bo serdanê tene malê. Gelek caran hemşîreyeke xwedîtaybetmendî dibînî, lê gava pêwîstî hebe, doktor û psikolog jî. Li van serdanan em kontrola pêşketina zarokî dikin, vaksînê didin û derbareyê tendurustiya wî dipeyivin. Bo nimûne derbareyê xwarin, razan û pêwîstiyên wî yên din. Piştgiya ji bo dêbavan hem ferdî û hem jî li nav grûbê tê kirin.



Şîretên civakî û piştgiyê. Şewirdarê Xizmeta Civakî yan jî kurator, pir î caran sosyonom in, li ser hizir û pirsên te yên derbareyê zaroka te, rewşa te ya malbatî, yan jî derbareyê dêbavên te dikare bi alîkariya te rabe. Ew her wisa dikarin derbareyê pêwendîkirina di gel daîreyên cihêreng jî bi alîkariya te rabîn û agehiyên din ên li ser civakê bidine te.

Zarokxaneya Vekirî. Zarokxaneya Vekirî dil û navenda Familjecentral'ê ye. Tu dikarî di gel zaorka xwe herî vir û bilîzî, fêrbibî, ji hevaltiya bi dêbavan piştgiyê werbigirî û malbatên li nêzîkî xwe nas bikî. Gava Zarokxane vekirî be, tu kengî bixwazî dikarî werî û herî. Pêwîst nake tu pêşî bêtî va ye ez tîm. Li vê derê mamosteyên zarokxaneyê dixebitin. Her wisa jî xebat û çalakiyên li vê derê bi bernamê ye. Bo nimûne, dema xwarinçêkirinê, dema strandinê yan dema rengkirinê cihê ye. Heger te bivê tu dikarî beşdar bibî. Gava tu bi zarokê xwe re li wir dibî, hingê tu ji zaroka xwe berpirsiyar î.

Li vir gelek caran kesên din ên li Familjecentral'ê dixebitin dibînî. Hingê tu dikarî ew pirs ku te li civîna demveqetandî ya dawîn ji bîr kiribû, ji wan bipirî.